# EV ŞER’A Ê K’Ê YE?



**Ezîz ê Cewo**

Ji 28-ê sibata 2026-an û vir va bi êrîşên hevp’ar ên DYA û Îsraîlê yên li ser Îranê agirê şêr’ gav bi gav li herêma R’ojhilata Navîn belav dibe. Û ev şer’a bandora xwe li ser r’ewşa aborî, siyasî, dîplomasî û xwezaya t’evahîya cîhanê dihêle. Lewra jî, hinek ç’avdêr û şirovegerên siyasî evê wek destpêka Şer’ê Sêyemîn ê Cîhanê dihejmêrin, her çiqas, bi dîtina hinekên dinê, Şer’ê Sêyemîn ê Cîhanê êdî jizûva dimeşe, û ev her p’êleke nû ya wî şer’î ye.

Bi dîtina hinekên dinê jî, Şer’ê Sêyemîn ê Cîhanê ji dema “Şer’ê Sar” va destpê bûye…

Çi bibêjî? Her kesek van bûyeran gor têgihîştina xwe ya cîhanê dinirxîne, lêbelê, tiştek li ber ç’avan e: *şer’ên asta cîhanî bi navberên biç’ûk va hert’im jî dem bi dem r’ûdane: cîhanê hê jî şer’ên Korêyayê, Vîyêtnamê, Afxanistanê, Pakîstan û Hindistanê jibîrnekirine. Hinek heya Krîzîsa Karîbê (a Kûbayê ya sala 1962-an) p’arç’eyekî wî şr’î dihejmêrin. Êdî em di derbarê şer’ên li dijî Îraqê, Lîbiyayê, Yûgoslavîyayê û yên dinê yên lokal da nabêjin… Jixwe, welatên Afrîkayê ji mêjva bûne qada şer’ên dewletên hêgêmon ên cîhanê.*

Ev dîtin hemû jî, heya astekê nêzîkî r’astîyê ne, lêbelê, ji van şer’an ev p’êla nû ya li dijî Îranê bi pîvan û bandor’ên xwe va bêhtir digihîje asta cîhanî!

Her çiqas li ser dik’eya t’êatroya vî şer’î ji hêlekê va DYA û Îsraîl, lê ji hêla dinê va Îran, wek aktor hene, di cîhanê da di derbarê vî şer’î da helwest û nirxandinên cuda r’ûdidin: *hinek her t’enê zirarên aborî dihejmêrin (bi t’aybet jî – yên gaz û petrolê!), hinek ji van êrîşan r’a ç’epikan lêdidin, yên dinê di wî da hewlên dagirkerîyê û mêtîngerîya navdewletî dibînin…*

Her weha, yên wisa jî hene, yên ku dibêjin: *“Çi ji me, çiqas ji wan tê, bila hev vegevizînin!?”*– Û ev jî, bi serê xwe, dîtink e!

… Û, heya ku hinek li vir û wir bersîvan diger’in, dixwazin sedemên vî şer’î têbigihîjin, agirê şêr’ êdî li herêma R’ojhilata Navîn belav dibe, û, wek ku tê xuyan, dijwar t’erefek bikaribe xwe ji bandora vî şer’î dûr bigirin, her pirs di wê da ye, k’a k’îyê vê r’ewşê çawa binirxîne û têbigihîje û, çiqasî bikaribe wê bandorê kêmtir bike!

Jixwe, di derbarê vî şer’î da bi r’ojane ewqas nûçe û agahî tên, ewqas nirxandinên ciyawaz tên pêkanîn, şirove û pêşdîtinên cuda dertên holê, û di nava wan da wisa jî yên li ser

asta konspîrologîyê, ku mirov pêr'a jî nagihîne wan hemûyan t'omar bike û binirxîne… Bi r'ojane, heya bi her gav û kêlîyekê r'a r'ewş tê guhar'tin…

Di vê r'ewşê da gel û welatên herêmê, û heya t'evahîya cîhanê êdî gav bi gav fêrî hewaya şêr' dibin, bi şêr' bêhnvedidin û jîyana xwe li gor wî serer'ast dikin…

Wisan e, ev cara yekem nîne, ku di dîroka mirovahîyê da bûyerên weha pêk tên. Ji xwe ji mêjva hatye gotin, ku dîroka mirovahîyê dîroka şer'an e …

Hinek nirxandinên me yên li ser vê mijarê di gotara "Dîrok xwe dubare dike" da hene, xwendevanên hêja dikarin di wê derbarê da li vira[1] bixwînin, lê em nirxandinên xwe bidomînin.

Ji talebextan r'a, hê jî ji mirovahîyê r'a li hev nehatye, ku dîrokeka altêrnatîv, a bê şer' û p'evçûn biafirîne! Û em – k'urd jî, wek net'ew, p'arç'eyekî vê mirovahîyê ne. Û her carê, dema me hewl daye, ku dîrokê têbigihîjin û ji wê dersan derxin, yek e, hert'im jî em, bûne beşdarên bêdeng ên pêvajoyên vê dîrokê, lewra ku me nikaribûye xwe bigîhînin hev, bibin yek, û r'amaneke hevp'ar a net'ewî derxin holê – û ji bo vê jî sedemên obyêktîv û sûbyêktîv hebûne. Û ji ber wan sedeman em p'ir'ê caran yek bi yek, p'arç'e bi p'arç'e bûne êzingên agirê van şer'an – bêyî daxwez û armancek a net'ewî!…

Û ev jî bi serê xwe ji bo me (dîsa – wek net'ew!) mijareke girîng e, ya ku pêdivîya xwe bi nirxandin û wat'edarkirinê heye, an – na, dîrokê dîsa xwe dubare bike, û emê dîsa di vê cîhanê da bê p'ar û maf bimînin…

Lewra jî, p'ir' girîng e, ev bûyerên ku di herêmê da pêk tên, bi baldarî bên nirxandin û wat'edarkirin! Em divê di sêrî da bikaribin ji bo xwe zelal bikin, k'a, *"ji vir û pêva li hember van bûyerên ku li herêmê pêk tên, helwesta me – k'urdan divê çawa be?"*

Ji bo ku em bikaribin ji vê pirsê r'a bersîvek a heşmendî bibînin, divê bikaribin ji bo xwe zelal bikin, k'a *ev şer'a ê k'ê ye, k'a ew ji çi hêlan va û çiqasî têk'ilîdarî me dibe?*

... Têgihîştina vê pirsê jî p'abendî têgihîştina wê r'ewşê ye, ya ku îro gelê k'urd têda ye: *ew pirsa statûsa gelê k'urd û welatê wî – K'urdistanê ye. Dibe ku, dê r'asttir bûya, eger mirov bigota, ku ew pirsa bêstatûsîya gelê k'urd û K'urdistanê ye!*

Û ev r'ewşa jî li ber ç'avan e, hîç pêwîst nake, ku mirov li hinek devaran li wê biger'e: K'urdisytan mêtîngehek a navnet'ewî ye, ew di navbera çar welatên herêmê da hatye p'arç'ekirin, ên ku ji hêla xwe va mêtîngehên dewletên gewre yên derva ne. Û gelê k'urd jî di welatê xwe yê dagerkirî û çarp'arç'ekirî da ne ku t'enê bindest û bêmaf e, lê, her weha, li hember wî bi r'ojane siyaseta têr'ora dewletê û t'evkujî pêk tên, heya ziman û çanda wî jî qedexe ne, bi t'aybet, di T'irkîyayê da heya hebûna gelê k'urd bi xwe bi destûrî di bin înk'arê da ye, zêdetirî 15000 girtîyên siyasî yên doza k'urdî di zinadanên wê da hene *(parlamênter, siyasetmeder, r'ojnameger, nivîsk'ar, mamosta, hunermend, çalakvan û di nava wan da wisa jî, dayîk, keç û xortên ciwan û zar'ok!)* , di Îranê da r'ojaane keç' û xortên k'urd, ên ku daxwez û doza mafên gelê xwe dikin, li meydanan tên darvekirin, bi hezaran jî di hebs û zîndanan di dir'izin...

Îjar, di vê r'ewşê da helwesta gelê k'urd li hember vî şer'î divê çawa be?

Hinek gotinek a pêşîyan bîr tînin: "Serê k'êrê – li zikê zeveş, çi ji me!?" – Helbet, ev helwestek a hestî ye! Lêbelê, her tişt wisa ne yekawa û zelal e, ku mirov wan wisa hêsan ji hev cuda bike – wek r'engên r'eş û sipî!

Hêzên mêtîngerîya navdewletî ji bo xatirê mafên gelên bindest nehatine û îro jî naên herêmê, pêdivîya wan bi k'aosekê heye – k'aos, a ku di bin kontr'ola wan da be, ku ew bikaribin ewê gor berjewendîyên xwe r'êvebibin û bikin xizmeta siyaseta xwe ya mêtîngerîyê… – Hew!

Bala xwe bidinê, dema r'êjîma baasî ya Seddam Huseyn li dijî gelê k'urd di Başûrê K'urdistanê da t'evkujî pêk tanî (Enfal !), û bi sedhezaran k'urd dibûn gorîyên vê bêdadîyê, cîhan bêdeng bû, heya hinek dewletan ç'ekên k'îmyewî jî difirotin wê r'êjîmê, yên ku paşê ji hêla wê va li dijî Helebçeya p'akr'ewan hatin k'aranî!

---

[1] https://amidakurd.net/ku/tekst/DÎROK_ XWE_DUBARE_DIKE

Û dîsa Cîhan bêdeng ma… Qey bibêjî, ew r'ewşek a normal bû, û divê hema wisa jî bibûya! Lê dema li wan pêwîst bû vê r'êjîmê bir'ûxînin, sedemek dîtin (a ku, paşê derk'et holê, tiştekî bê bingeh û vala bûye!), û dest bi pêvajoya r'ûxandina Îraqê kirin… Û di encamê da ev k'aos t'evdan, ji leşker û fermandarên art'êşa baasî ya têkçûyî hêzek a îslama r'adîkal – DAÎŞ sazkirin û berî bedena herêmê dan. Û di encamê da ev r'êxistina îslama r'adîkal di Şamê da anîn ser desthilatê...

Dema di şer'ê li dijî DAÎŞ-ê da k'urdên R'ojava di nava Hevpeymanîya dijî DAÎŞ-ê da bi lehengî û fedek'arî şer' kirin, 15000 p'akr'ewan dan, dema here kirîtîk r'êvebirîya DYA-yê berê xwe ji k'urdan guhar't, pişta xwe sparte HTŞ-ê (şaxekî DAÎŞ-ê!). Û di encamê da t'evkujîyên li hember t'axên k'urdan ên Helebê yên Eşrefîyê û Şêx Meqsûdê pêk hatin (di bin ç'avdêrîya hêzên qaşo hevpeymanî da!), Kobanîya lehenga şer'ê dijî DAÎŞ-ê kirin nava dorpêç'ê, û di encama wê r'ewşê da zar'ok ji birçîya dimirin. Û di vê navberê da T'irkîya endama NATOyê û hevpeymanîya DAÎŞê jî alîk'arîya mirovî, ya ku ji bo Kobanîyê diçû, ji ser sînor vedger'and, û ev cîhan, a ku xwe şaristanî dihejmêre, bêdeng û bêç'are ma.

… Û ew dorpêç' hê jî didome …

Bi vê xiyanetê r'ewşeke wisa derk'etibû holê, ku dikaribû şer'ê di navbera gelên k'urd û erb da derk'eta (dibe ku armanca qaşo hevpeymanîya li dijî DAÎŞ-ê jî, hema ev bû?!), lê r'êberê gelê k'urd bir'êz Ocalan ev yek pêşda dît û di dema xwe da r'êvebirîya R'ojava û fermandarîya giştî ya HSD-ê hişyar kirin, û k'urd nehatin listikên hevpeymanîyên demekê … Di vê derbarê da bi berfirehî di gotara me ya "Dîrok xwe dubare dike" da heye.[2]

Û piştî vê, dema bi hewl û helwestên r'êvebirîya DYA desthilata DAÎŞ-î ya Şamê hate r'ewakirin, naha jî bi hewlên wan divê k'urd bi DAÎŞ-îyan r'a welatekî hevp'ar ava bikin, û di wê Sûrîyayê da, wek ku berdevkê komîteya serokatiya vî welatî (a HTŞ/DAÎŞ-î!) Ehmed Hilalî dide bawerkirin, dê R'êveberiya Xweser an Kanton nemînin[3]…

Hema wisa!

Û piştî vê, wek ku R'êxistina p'arastina mafên mirov a Sûrîyayê *(SOHR)* r'adigihîne, firoşgeheke cilûbergan a navenda bajarê Efrînê ji hêla hêzên ewlek'arîya hukumeta demkî ya Sûrîyayê va hatye girtin, û xwedîyê wê jî hatye binç'avkirin, ji ber ku … navê wê "R'ojava" bûye.[4]

Bi r'astî jî, wek ku vêtêranê dîplomasîya amêrîkî, şêwirmendê demekê yê Ewlek'arîya net'ewî yê Donald Tramp, şroveger û nivîsk'ar Con Bolton dibêje, eş-Şaraa nedaye bawerkirin, ku ewî dest ji paşer'oja xwe ya têr'orîstîyê û têk'ilîyên xwe yên bi Cebhet-an-Nûsrayê r'a berdaye..[5]

Û DYA-yê jî îro ev mirova r'ewa kirye û danye ser desthilata Sûrîyayê!

De, îja were û têbigihîje, k'a ev mirovê bi gîyan û mejîyê DAÎŞ-î dê çawa bikaribe bi wan kesên bi heşmendîya el-Qaydayî-Daîşî r'a, yên ku ewî li dora xwe bervkirine, Sûrîyayeke aram a bi dêmê mirovî ava bike?

Vê pirsê jî, em ji Mala Sipî r'a bihêlin û bibêjin, ku T'evgera net'ewî û gelê k'urd r'ewşên vî r'engî dîsa dîtine, û her carê bi bir'yar r'ê û r'êbazên pêwîst ji bo têk'oşîna xwe dîtine û ew domandine. Ji vir û pêva dest bi p'êleke nû ya têk'oşna ji bo mafên gelê k'urd dibe – bi r'êyên siyasî û dîplomasî. Û misogerî-garantîya vê jî Yekîtîya Net'ewî ya Gelê K'urd û Hêzên Xwep'arastinê ne…

Û ev, a ku îro di Sûrîyayê da pêk tê jî, ji nedîtîyan va dernek'etye holê, ew destpêka xwe ji dewra yekem (2017 – 2021) a serokdewletîya Donald Tramp digire.

Tiştekî balk'êş! Bala xwe bidinê: hema wê demê, dema Donald Tramp piştî danûstandin-bazarîyên bi Erdoxanê serokk'omarê T'irkîyayê û emîrê DAÎŞ-ê yê ne formal r'a r'adi-

[2] https://amidakurd.net/ku/tekst/DÎROK_ XWE_DUBARE_DIKE

[3] https://youtu.be/-mdzSm0ARfs?si=0WUAJfrzbodUYfYL

[4] https://nupel.tv/afrinde-rojava-yasagi-is-yeri-kapatildi-sahibi-gozaltina-alindi/

[5] https://www.amidakurd.net/ku/tekst/Hişyar_bin_MIROVAHÎ_DI_NAVA_T_OR_A _DEK _Û_DOLABÊN_NAVDEWLETÎ_DA_TÊK_DIÇE

gihîne, ku ew dixwaze hêzên xwe yên leşkerî ji Sûrîyayê vek'işîne, *Efrîn, Girê Sipî û Serê Kanîyê* ji hêla T'irkîya hevpeymanîya DAÎŞ-ê û Endama NATO-yê va tên dagerkirin (ew jî di bin ç'avdêrîya hêzên qaşo hevpeymanî yên bi serk'êşîya DYA da!) … Û, wek ku tê gotin, di kabîna Tramp da ne hemû r'ayedarên p'ayebilind bi van bazarîyên serokdewlet r'a bûne, lewra jî, di encamê da şêwirmendê ewlek'arîya net'ewî yê serokdewletê DYA Con Bolton dest ji k'ar dik'işîne (10-ê r'ezbera 2019-an), piştî salekê wezîrê berevanîyê Mark Êspêr jî dest ji k'ar berdide… Ç'avdêr û şirovegerên siyasî, li ser bingeha agahîyên ç'avkanîyên xwe yên hindur'în (*însaydêr / insider*) van destjik'arberdanan bi wê şrove dikin, ku ev camêrana dijî hevk'arîya Tramp a bi Erdoxan û DAÎŞ-ê r'a bûne… Di derbarê têk'ilîyên Tramp ên bi Erdoxan r'a agahîyên balk'êş li bal Con Bolton he-ne.[6]

Û li vira ya balk'êş ew e, ku dema dewra duyem a serokdewletîya Donald Tramp, bi r'êya pêwendîyên bi Erdoxan r'a gav bi gav têk'ilîyên wî bi serokê HTŞ-ê (şaxekî DAÎŞ-ê) r'a dik'evin praktîkê û di encamê da desthilata DAÎŞ-ê di bin sîwana DYA da li Şamê tê r'ewakirin … Û dîrok dîsa dubare dibe.

Û êdî ji vir û pêva, li ser r'êya hevk'arîya Tramp û Colanî (eş-Saraa), hîç kesek, ê ku di derbarê DAÎŞ-ê da nêr'îna xwe ya cuda hebe û wê bîne zimên, nikare cîhê xwe li r'ex Tramp bimîne.

Lêbelê, wek ku tê xuyan, her çiqas mînaka destjik'arberdana Con Bolton û Mark Êspêr êdî hebûne jî, lê dîsa, kesên weha, yên ku bêdeng nemanin û nêr'îna xwe ya cuda bi fermî beyan kirine, derket'ine.



*Wênê: ê REUTERS-ê*

Weha, yek ji wan mînakan: piştî mehekê pey hevdîtina yekem (05. 2025) a Donald Tramp bi eş-Şaraa r'a, Fermandarê Fermandarî-ya Navendî ya hêzên Amêrîkayê (CENTCOM / SÊNTKOM) gênê-ral Mayk'l Kûrîlla (Michael Ku-rilla) di civîna Kongrêssa Amêrî-kayê da beyan dike, ku *hê jî hêza DAÎŞ-ê maye, ku ew dikare zêndî bibe û jinûva dest bi êrîşan bike, ku DAÎŞ dixwaze r'ewşa li Sûrîyayê ji bo xwe k'ar bîne, û, eger zext li ser wê bên kêmkirin, ew dikare di na-va du salan da Sûrîyayê kontrol bike …*[7]

Wek ku tê xuyan, axavtineke weha ne gorî planên Tramp û Erdoxan bye. Lewra jî, piş-tî wê Mayk'l Kûrîlla dest ji p'eywira xwe berdide (an li wî didin berdan?!) û li şûna wî admiral Brêd Kûpêr tê p'eywirdarkirin…

Û piştî van guhar'tinan dest bi r'êzebûyarên trajîk dibe: *êrîşên li ser t'axên k'urdan ên Helebê yên Eşrefîyê û Şêx Meqsûdê pêk tên, alozîyên li herêmên R'eqqayê û Dêra Zorê û dorpêç'a Kobanîyê dertên holê…* Û ev hemû di bin sîwan û ç'avdêrîya DYA da!

Îro DAÎŞ di bin sîwana DYA da êdî Sûrîyayê hiltîne bin kontrola xwe, lewra ku hev-peymanîya li dijî DAÎŞ-ê êdî bûye p'ara dîrokê û li şûna wê hevpeymanîyeke nû – ya DYA-DAÎŞ-ê k'etye jîyanê!

Ji bo çi me wisa ji dûrva destbi nirxandinên xwe kir?

Ji bo wê, berî ku bê ber heşê hinekan, hêvîyên xwe bi êrîşên mêtîngerîya navdewletî va girêbidn, bizanibin, ku *hêzên mêtînger ne ji bo xatirê wê bi şer' hatune herêmê, ji ber ku*

[6] https://www.amidakurd.net/ku/tekst/Hişyar_bin_MIROVAHÎ_DI_NAVA_T_OR_A _DEK _Û_DOLABÊN_NAVDEWLETÎ_DA_TÊK_DIÇE

[7] https://youtu.be/D9Y1USskHqA?si=DbpblaVY7iml3mHL (ji hûrdema 3:20 – 4:54)

*r'êjîma Îranê li dijî gelên vî welatî siyaseta dijmirovî pêk tîne, bi şêweyên sedsalên navîn mirovan bi fîzîkî t'une dike, lê her weha azadîya r'amanê û mafên gelan binp'ê dike û di mirov da mirovbûna wî dikuje.*

Na!






Eger armanc ew bûya, dema r'êjîmê bê hêvşandin û bi bêwijdanî r'oj di nava r'ojê da mirov li meydanan darvedikirin, ku bi dehhezaran dot û lawên gelê k'urd ên here hêja– *mamosta, r'ojnameger, hunermend, siyasetmeder, çalakvan* di hebs û zîndanên vê r'êjîma paşver'û da li benda darvekirina xwe ne, dê hema carekê dengek ji van dewletan derk'eta… Wan dikaribûn ev pirs di Civîna Giştî ya Net'ewên Yekbûyî da bikirana mijara nirxandinan, êmbargoyên aborî daneyna ser r'êjîmê, wek ku ew wisa bi hêsane, bê merc û pîvan di cîhanê da li dijî dewletan k'artînin…

Na, ev şer'a ne ê gelên Îranê û herêmê ye!

Erê, pirsgirêkên gelan bi vê r'êjîmê r'a hene, bila ew bi xwe pirsgirêkên xwe ç'areser bikin, eger alîk'arî û piştgirîyek a navnet'ewî pêwîst bike, ew divê bi r'êyên siyasî, dîplomasî, civakî û aborî pêk bê. Ji bo vê sazî û r'êxistinên navnet'ewî hene, dawîya dawîyê R'êxistina Net'ewên Yekbûyî heye, ya ku van hêzên mêtîngerîya navdewletî kirine r'êxistina berîkê û li şûna wê, lê bi şêweyê xwe yê dagerkerîyê û ji bo berjewendîyên xwe yên mêtîngerîyê pirsgirêkan ç'areser dikin. Rasttir bibû, mirov bigota – k'urtir dikin! …

Û kesek nizane, k'a ev mêtîngerên navdewletî, dê piştî r'ûxandina vê r'êjîmê hêzek a wek DAÎŞ-ê neynin ser desthilatê, wek ku di Sûrîyayê da pêk anîn?! K'a, gelo, dê wisa nebe, ku paşê gelên Îranê xwezîya xwe bi vê r'êjîma paşver'û bînin, wek ku îro hinek di Sûrîyayê da xwezîya xwe li dema Beşar Esed tînin.

Û pirseke dinê jî, eger k'în û nefreta li hember r'êjîmê di nava gel da gihîştibû astek a here bilind, piştî van êrîşên hevp'ar ên DYA û Îsraîlê, ew dak'etye jêr. Divê neyê jibîrkirin, ku di nava 47 salên r'êvebirîya vê r'êjîmê da bi dehan nivş bi r'uhê wê hatine p'erwerdekirin – bi fanatîzma here t'und va. Û encamên vê p'erwerdeyê wisa bi hêsane winda nebûne, ew ji ber van êrîşan bi r'engekî dinê xurttir dibe û dê hîn encamên nû derxe holê.

Heya, eger ev r'êjîm bê r'ûxandin jî, ev helwest dê di nava gel da, di nava nivşên dihatûyê da hê dirêj bimîne… Û, dibe ku paşê hinek bi k'în û nefret vî şer'î bîr bînin, lê hinek jî, dibe ku ji DYA û Îsraîlê r'a spasîyên xwe bibêjin, ku wan bi van êrîşên xwe fanatîzma t'erefdarên wan xurttir kirine! – Na, na, ne ji bo r'ûxandina r'êjîmê, jixwe, ev r'êjîm dê r'ojekê bir'ûxya, lê ji bo wê, ku wan di nava gel da nefreta li hember xwe, wek dagerker, wek mêtînger, tûj kirin û bingeha îdêolojîya r'êjîmê ji bo demekê li ser p'êyan hiştin.

Afxanistan tê bîra we?!

Lewra jî di vê r'ewşê da divê neyê jibîrkirin, ku gelê k'urd bi sedê salan bi r'uhekî t'aybet ji bo mafên xwe yên mirovî û net'ewî têk'oşyaye û bi her p'êleke berxwedanê r'a bi cêr'ibandinên nû dewlemend bûye û îro bi p'êla nû ya Têk'oşîna R'izgarîxwaz r'a xwe gîhandye astekê nû … Û vî gelê berxwedêr dersên dîrokê jî ji bîr nekirine. Di vê r'ewşê da ya sereke Yekîtîya Net'ewî ye. Û ew ku şeş partîyên R'ojhilatê K'urdistanê li ser platforma net'ewî yekîtîya xwe avakirine, p'ir' girîng e, û hêvî heye, ku dê hîn r'êxistinên dinê jî di nava vê Yekîtîyê da cîhê xwe bigirin.

R'ewş r'oj bi r'oj tê guhar'tin. Amedekarîyên şer'ê bejayî tên kirin. Û di vê r'ewşê da r'êjîma T'irkîyayê dê fersendê ji dest xwe bernede, ku di bin navê şer'ê dijî r'êjîmê da derbeyê bigihîne T'evgera K'urdî di R'ojhilatê K'urdistanê da. Û li vir jî divê ne ku t'enê

ku'rdên R'ojhilatê, lê, her weha, yên t'avahîya welêt û devayî welêt li doza gelê R'ojhilatê xwedî derk'evin, bi t'aybet jî, sazî û r'êxistinên Bakûrê K'urdistan. Divê her tişt bê kirin, ku nehêlin êrîşên r'êjîma AKP-MHP-î ya T'irkîyayê pêk bên…

Wekî dinê, hêzên k'urdî dê di pêvajoya şer'ê bêjeyî da bi t'evger gel ji êrîşan bip'arêzin, hewl bidin, di dema xwe da wî ji navçeyên êrîşan vek'işînin cîhên bi ewle…

Û pirsek a dinê ya girîng jî, di vê r'ewşê da dê pêdivî bi hevk'arî û hevpeymanîyek a hêzên Îranê yên dijî r'êjîmê hebe, ji bo ku ew amade bin, eger r'êjîm bik'eve, hêzên derva xulamok û xwefiroşan neynin li ser serê wan daneynin. Divê ew bi xwe amade bin, ç'arenûsa xwe hildin destê xwe. Heya wisa bikin, ku ev r'êjîm ne ku bi desttêwerdana hêzên derva bê guhartin, lê bi beşdarîya wan a aktîv…

Divê bê zanîn, ya ku îro derfet daye hêzên derva yên mêtînger, ku êrîşê bînin ser Îranê, ew bêdengîya gel bi xwe ye … Ma, evên ev r'êjîm t'ehmûl kirine û îro jî t'ehmûl dikin, k'î bûne? Ew ne îranî ne? Yên ku dik'evin xizmeta vê r'êjîmê û gelê xwe dizêrînin, ne îranî ne? Yên ku li ber ç'avê wan ev bêdadîyên li dijî gelê k'urd pêk tîne, k'î ne, ne îranî ne? Ji bo vê jî, divê gelên Îranê bi xwe di nava xwe da hêz û bir'yardarîyekê bibînin, r'êjîmê biguhêr'in û li hember van êrîşên ji derva r'awestin… An – na, eger hinek li ser p'êla vî şer'î, bi alîk'arîya hêzên mêtînger bên ser desthilatê, pirsgirêkên gelên Îranê dê neyên ç'areserkirin. Jixwe, cêribandina wan heye, wek ku ewana hêzan DAÎŞ-ê r'ewakirin û di Sûrîyayê da anîn ser desthilatê, dê ji bo Îranê jî hêzek a wek wê bibînin, r'ewa bikin û bînin ser desthilata Îranê...

Û ji bo ku tiştekî weha neyê serê Îranê jî, divê îranî bi xwe – *fars, k'urd, azerî, bêlûc* û yên dinê, amade bin, eger na, kesek nizane, k'a piştî vî şer'î, dê çi ji vî welatî bê.

Gelên Îranê bi xwe divê li xwe xwedî derk'evin, kesek dê ji derva neyê û pirsgirêkên wan ç'areser neke.

Di têk'oşîna xwe ya ji bo mafên xwe yên mirovî û net'ewî k'urdên R'ojhilatê K'urdistanê di warê siyasî û berevanîya gel da bûne hêzekê, ya ku dê di van r'ojên giran û dijwar da ji bo ewlekarîya gel erk'a xwe pêk bîne…

Ji destpêka vî şer'ê hevp'ar ê DYA û Îsraîlê yê li dijî Îranê êdî sê hevtê bihurîn, û gelê me gihîşt R'oja xwe ya here pîroz, Cejna Netewî – Newrozê.




Êdî ev çendek e, gelê k'urd li seranserê K'urdistanê û li derveyî welêt bi dilgermî Newroza Azadîyê bi slogana "Ji Ocalan r'a azadî, ji K'urdistanê r'a status!" Pîroz dike…

Û li ser vê note, bi hêvîya r’ojên azad, ku hemû hêvî û bendewarîyên gelê k’urd pêk bên, ku ew di welatê xwe da bibe xwedî statûs û azadî, em jî Cejna Net’ewî – Newroza Azadîyê li k’urd û k’urdistanîyan û mirovahîyê azadîxwaz pîroz dikin û di têk’oşîna mafdar da ji gelê me r’a serk’evtinê dixwazin!

**20. 03. 2026.** **Pyatîgorsk/R’ûsîya**